

Anesteziya giştî ya zarokên we

Ev belavok rave dike ku divê hûn li benda çî bin dema zarokek yan ciwanek ji bo niştergeriya bi benckira gelemperî were nexweşxaneyê û çî tê hêvîkirin. Ev ji hêla bijîşkên bencê ve hatiye nivîsandin, ku bi nûnerên nexweş, dêûbav û lênihêrkeran re dixebitin.

Naverok

Belavok van xalan rave dike:

- agahiyên giştî li ser benckirin û li ser fîma ku li zaroka we digerin
- Hûn dê çawa zaroka xwe ji bo niştergeriyê amade bikin
- Hûn dê li ku derê çavkaniyên agahdariyê ji bo zarok û ciwanan bibînin
- Dê beî niştergeriyê çî bibe
- Dê di roja niştergeriyê de çî bibe
- Dê piştî niştergeriyê çî bibe
- metirsî û biryargirtina hevpar.

Derbarê benckirinê

Benckirin bi gelemperî piştrast dike ku zaroka we di xewek kûr de be û di dema niştergerî yan çî pêve çûnên din bê êş e.

bûjenên benckirinê derman in ku ji bo destpêkirin û domandina benckirinê tîk bikaranîn.

- Hin bûjenên benckirinê bi dermanê di nav damarek de bi karanîna lûleyek plastîkî ya bi navê kanûla dest pê dikin.
- cûreyên benckirinê yê din bi bêhnkişandina gazê bi rûpoşek li ser dev û poz dest pê dikin. Bi gelemperî gava ku zaroka we di xew de ye, kanûl tê danîn.
- benckirin dikare bi berdewamkirina bêhnkişandina gazê yan jî dayîna benckirekê bi riya kanûlayê, yan bi hevgirtina her duyan ve were domandin.

Bijîşkên bencê bijîşkên pispor in ku benckirinê didin û di dema niştergerî û başbûnê de li tendirustiya zaroka we dinêrin. Herwiha ew piştî niştergeriyê ji nêz ve bi dermanên kêmkirina êşa zaroka we re eleqedar dibin.

Nirxandina berê niştergeriyê, kontrolkirin di rêya telefonê

Dibe ku hemşîreyek ji nexweşxaneyê beriya roja niştergeriyê bi telefonê li we bigere da ku hin hûrgiliyên di derbarê tendirustî û dermankirina zaroka we de fêr bibe. Herwiha, ev destûr dide wan ku heke pêwîst be beriya niştergeriyê hin pîvan û amûrên din dirust bikin.

Gelek nexweşxane dê zarokan, bi taybetî yê xwedî nexweşiyên demdirêj in yan jî dikevin niştergeriyên girîng, vexwîne ku beşdarê nirxandina berê niştergeriyê ya klînîkê bibin. Li vir ew dê pirsên di derbarê tendirustî, dermankirin û lênehatinên zaroka we de ji we bikin. Ew dê çeltek ji çermê hildin (çerm bi riya çovikek pembû û bi awayek nazîkane tê firikandin) da ku ew beriya niştergeriyê bikaribin ji bo enfeksiyonan kontrol bikin û testên xwînê bikin ku belkî pêwîst be.

Dibe ku hûn bijîşkekî bencê bibînin ku karibe qala bijareyên benckirinê û metirsiyên taybet ji we re bike. Pispore benckirinê yan hemşîreyê pêş-nirxandinê bi gelemperî dê li ser serhatiyên berê yê zaroka we yê bi bûjenên benckirinê yan derzian re dê pirsan bike, wek nimûne derziyên vaksînê. Bi gelemperî sedemên bijîşkî hene ku çima yek core benckirin ji ya din çêtir dibe. Ew ê bi we re nîqaş bikin ka ew ê çawa pêşniyara destpêkirina benckirinê û sedemên vê yekê bikin.

Piştî nîqaş bi we re, dê planek were pejirandin. Carinan dibe ku pêdivî be ku plan were guhertin, li gorî berteka û bersiva zaroka we di roja niştergeriyê de.

Roja niştergeriyê yan roja beriya wê heke hebe hûn ê karibin pirsên xwe bînin ziman.

Amadekirina zaroka we

Çend tişt hene ku hûn dikarin bikin ji bo zaroka xwe ji hatina nexweşxaneyê re amade bikin. Heke zaroka we pir piçûk nebe, divê hûn hewl bidin û rave bikin:

- ku ew diçin nexweşxaneyê
- ku ew ê bikevin niştergeriyekê yan testekê
- hin agahdariyên bingehîn di derbarê çî dê bê serê wan dema ew li nexweşxaneyê bin.

Dema çêtirîn ji bo dayîna van agahdariyan li gor zarokan diguhere. Zarokên pêşdibistanê dibe rojek berî bizanibin bes e. Dibe ku ji bo zarokên mezintir bêtir dem lazim be.

Herweha di malpera me de ji bo zarokên temenên cuda jî belavok hene ku bi zimanên cuda li vir hene: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages. Agahiyên bêtir jî hene li ser Komeleya Bijîşka/ê Benckirina Zarokan ya Brîtanya Mezin û Îrlanda yê li: www.apagbi.org.uk/children-and-young-people

Hin nexweşxane derfetê didin zarokan ku beriya roja niştergerî biçin beşa niştergeriyê ya zarokan yan jî odeya benckirinê. Ev awayek baş e ku ji amadekirina zaroka we alîkar be û nîgeraniyê kêmbike. Hin nexweşxane bi rêya app û vîdyoyan wek serdanek rastî pêşkêş dikin.

Li gelek nexweşxaneyan fîmek lîstik-terapiyê heye ku dikare bi lîstikê ravekirinan bike û berhevdanê handan bike.

Ji zaroka xwe re çi bêjin

- Vebêjin ku niştergerî yan ceribandin dê alîkariya zaroka we bike ku baştir bibe yan rewşek bijîjkî ya heyî baştir bike.
- Zaroka xwe handan bikin ku li ser niştergeriyê biaxive û pirsan bike. Pirtûk, lîstik û çîrok dikarin bibin alîkar.
- Ji zaroka xwe re li ser demkirinê bêjin. Dê kengê bikevin niştergerî yan verastkirinê? û Dê mayîna wan li nexweşxaneyê çiqas dirêj be (eger hûn vê dizanin)?
- Heke zaroka we bi şev li nexweşxaneyê bimîne, bila ew bizanibin ku hûn ê jî karibin bimînin yan na. Heke hûn ne bawer bin ku ev mimkun e yan na, hûn dikarin ji nexweşxaneyê re telefon bikin bo piştrastkirinê.

Dê çi bînin nexweşxaneyê

Hemşîreya we dikare li ser tiştên ku divê hûn bînin nexweşxaneyê şîretan li we bikin, lê ji kerema xwe van bînin:

- her dermanek biserhev be, di pakêta xwe ya orjînal de, ku zarokê we bi gelemperî digire
- pîjama, palpiştan, kincên yedek, guheztina kincan an jî pelikan
- firçeya diranan, merhema diranan, firçeya por û pêlavan
- hirçê pêlîstok yan pêlîstokek bijare
- pirtûkek yan tabloya xêzkirinê
- telefonên destan û cîhazên elektronîk lê bi şarj û guhêk.

Zarok pir caran kêfa xwe dikin ku biryar didin ka çi bi xwe re hilgirin, lê çêtir e ku meriv pir pêlîstokan neke, ji ber ku pêlîstok û çalakî bi gelemperî ji hêla nexweşxaneyê ve têne peyda kirin.

Ne baş e hema beriya niştergeriyê?

Heke di nav du hefteyên niştergeriyê de kuxikek yan sermayek giran li zaroka we peyde bû, yan jî di nav çend rojên niştergeriyê de zikêş yan vereşandin peyde bû divê hûn ji nexweşxaneyê re telefon bikin. Dibe ku lazim be niştergeriyê biderengî bikin heta ku zaroka we baştir be.

Ji ber kuxik û sermayê dibe ku zarok, nemaze yê piçûktir, di bin benckirinê de zehmetiya bêhnkişanê bikşînin. Ev yek dikare zarokan jî bixin bin metirsiyên mezin ya enfeksiyona singê. Ji ber vê yekê girîng e ku hûn karmendên nexweşxaneyê agahdar bikin ku zaroka we nexweş bûye.

Herwiha divê hûn karmendên nexweşxaneyê agahdar bikin ka zaroka we di van demên dawî de bi xuîk, sorik yan enfeksiyonên din ketiye yan na.

Bi gelemperî, derzîlêdanin nûjen ji bo zarokên ku benckirinê derbas kirine ne pirsgerêk e heke beriya niştergeriyê neketibin tayê, ku di vê rewşê de hin caran çêtir e niştergerî were taloqkirin. Ev rewşekî gelek neasayî ye, lewma em li dê û bavên pêşniyar dikin ku ew derzîlêdanin plankirî bidomînin û wan ji ber niştergeriya plankirî betal nekin.

Metirsî û biryargirtina hevpar

Pirsgirêkên giran bi bûjenên benckirên nûjen re nayên pêkanîn. Piraniya zarokan zû bi zû baş dibin û piştî neştergerî û benckirina vedigerin rewşa xwe ya normal. Dibe ku gelek zarok nebaş hîs bikin û kulbûna gewriyê hebe. Ev bi gelemperî demek kurt berdewam dike. Dermanên ji bo dermankirina vereşandin û nexweşiyê peyda dibin û gelemperî têne dayîn.

Hûn dikarin bêtir agahdarî li ser **bûyerên hevpar û metirsiyên benckirinê** ji bo zarok û ciwanên ku bi benckira gelemperî digirin li ser www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages bibînin

Biryargirtina hevpar

Biryargirtina hevpar piştrast dike ku mirov têne piştgirî kirin da ku biryarên ku ji bo wan rast in werbigirin. Ew pêvajoyek hevkarîyê ye ku bi navgîniya wê bijîşkek piştgiriya dide nexweşekî da ku ji bo dermankirina xwe bigihîje biryarekê.

Di axaftinê de van xalan tîn destnîşankirin:

- pisporîya karmendê tendurîtiyê yê klînîkê, wekî vebijêrkên dermankirinê, delîl, metirsî, û sûd
- tiştên ku nexweş baştir dizanin: tercîhên wan, şert û mercên kesane, armanc, nîrx û bawerîyên wan.

Agahîyên zêdetir li vir bibîne: www.england.nhs.uk/personalisedcare/shared-decision-making

Li vir hin amûr hene ku tu hûn dikarin bikar bînin da ku hûn bi baştirîn şêwe sûdê ji nîqaşên bi bijîşka bencê an xebatkarên nîrxandina emeliyatê re werbigirin:

Hilbijartina çarçoveya Wisely UK BRAN

Vê yekê wekî bibîrxistinekê bi kar bîne da ku tu li ser dermankirinê pirsan bipirsî. https://bit.ly/CWUK_leaflet

NHS sê pirsan dipirse

Dibe ku di derbarê çavdêriya tendurîstîya te hilbijartin hebin. https://bit.ly/NHS_A3Qs

Navenda Çavdêriya Pêş-neştergeriyê (CPOC)

CPOC anîmasyonê hilberandîye da ku biryargirtina hevpar rave bike. www.cpoc.org.uk/shared-decision-making

Di roja niştergeriya zaroka we de

Divê nexweşxane di derbarê wexta ku divê zaroka we dev ji xwarin û vexwarinê berde agahiyên zelal bide we. Şopandina van agahiyên ji bo we û zarokê we gelek girîng e.

Gava benckirinê heke di hinavê zaroka we de xwarin yan jî tiştê avîn mabe, dibe ku ew were qirika wî û ji wir jî here pişa spî ya wî. Heke zaroka we di demek nêz de xwarin xwaribe, niştergerî dê derengî bê kirin an jî bê taloqkirin bo rojeke din.

Heke ew ji dema pêwîst dirêjtir bêyî xwarin û vexwarin nesekinin zarok aramtir hîs dikin. Hin nexweşxane destûr didin an teşwîq dikin ku zarok di hatina xwe de tiştê vexwin.

Yên jêrîn, bi gelemperî demên lihevkiirî ne ji bo ka beriya niştergeriyên ne-lezîn kengê hûn dikarin xwarin û vexwarin bidin zarokên xwe; lê ji kerema xwe agahiyên ku nexweşxaneyê dane we bişopînin çimkî dibe ku ew ne heman bin.

- Zarok dikarin şeş saet beriya niştergeriyê xwarinek sivik û/yan jî qedehê şîr bixwin û vexwin. Piştî wê, divê ew tekez şîrî jî di nav de tiştê nexwin û benîşt necûn.
- Pitikên li ber şîr heta çar saet beriya niştergeriyê jî dikarin şîrê dayîkên xwe bimijin.
- Pitikên ber bîberonê heta şeş saet beriya niştergeriyê dikarin mamayên xwe bixwin (ji kerema xwe ji bo pitikên gelek piçûk an jî pitikên zûzayî li agahiyên cuda yên nexweşxaneyê xwe binêrin).
- Heta saetek beriya niştergeriya wan, divê zarok vexwarina avê an jî vexwarinên zelal bidomînin. Ev alîkarîya wan dike ku avdar û aram bimînin.

Roja niştergeriyê, divê zarokê we dermanên ku hatine gotin bigre.

Gava hûn gihiştin nexweşxaneyê, qam û giraniya zarokê we dê bê pîvandî (heke ev jixwe di hevdfîna berê de nehatibe kirin). Hemşîreyek dê taya wan, lêdana dil, rêjeya bêhngirtinê qontrol bike û asta oksîjena wan û fişara xwînê bipîve.

Pratîkeke standart e ku ji bo hemû keçên ser 12 salî bi rêya girtina mînaka mîza piçûk testa ducanîbûnê bê kirin. Agahiyên bêtir dikarin li vir werin dîtin:

<https://bit.ly/NHS-Leaflet>

Hemşîre dê pîrsa dermanan û alerjiyan bike û dê du bandên nasnameyî li ser zend an jî gozekên zaroka we bixe. Di hin nexweşxaneyan de heke lênehatina zaroka we hebe, ew dê bandeke zêde yan jî bandeke bi rengekî cuda bi wan bixin.

Beriya rêgihê dê bijîşka bencê were we bibîne da ku benckirina zaroka we nîqaş bike.

Lazim e ku bijîşka bencê di derbarê tendirustiya giştî ya zarokê we de agahdar be, tevî:

- tecrubeyên berê yên benckirinê
- hemû dermanên ku zaroka we bikar fîne
- hemû lihevnehatin ku yên wan hene
- hemû kuxik, sermagirtin yan jî virik û vereşandin demên dawî.

Heke zaroka we an jî endamên din yên malbata we berê di jwariyêke bi benckirê re kişandibin, gelek girîng e ku hûn ji bijîşka bencê re bêjin û hemû agahdariyên li gel we bidinê.

Ev demek baş e ji bo qalkirina endîşeyên ku we û zaroka we di derbarê benckirinê de. Heke hûn lîsteyeke pirsên ku dixwazin bikin derxin, dibe ku bo we bibe afîkar.

Girêdayî cureyê niştergeriya zaroka we, gava ku zaroka we hê di xew de be dibe ku bijîşka bencê derziyên benckirinê cîkî lê bixe da paşê êşên wê siviktir bibin.

Herwiha dibe ku lazim be dilop yan jî kanûlayên din zêde bi kar bînin. Ew ê bi we re sedemên kirina vê û giringiya ekîpmanan nîqaş bikin bo ewlehiya zoraka we di dema xew de û rehetiya wan wexta şiyar bibin.

Derengxistina niştergeriyê yan jî peygerînê

Carna di dema nixandina zaroka we de, dibe ku bijîşka bencê tiştek di derbarê zaroka we de fêr bibe û ew jî bê wateya ku dê ewlehîtir be heke prosedûr ew roj neyê pêkanîn. Heke ev biqewime, ew ê pêşniyar bikin ku kengê domandina presodûrê dê ewletir be.

Berîdermankirinê ('pêşpijişkî')

Ev navê her dermanê ku berî benckirinê tê dayîn e.

Bijîşka bencê dikare bi we re li ser hewcedariya dermanê amoškirinê bipeyive da ku afîkariya zaroka we bike ku rihet bibe. Lê belê, ev bi gelemperî nayên dayîn ji ber ku ew dikarin zarokan pişfî niştergeriyê gêj bikin. Dermanên kêmkirina êşê dibe ku wekî pêşpijişkî werin dayîn, an bijîşka bencê dibe ku ji bo şertên wekî astimê dermanên din pêşniyar bike.

Piraniya dermanên pêşpijişkî wekî dermanên şil bi dev têne dayîn, lê hin nexweşxane rêbazên din bikar tînin.

Melhema benckirina cîkî

bi gişfî hemî zarok 'melhema tevizandin' li pişt destên xwe bidin û kinceke paqij lixwe bikin. Ew melhema benckira cîkî ye ku 30-60yan de dixebite.

Ev melhema hestê kêmkirina dîmê dema kanûlayeke bikeve dest an jî milê zaroka we.

Heke melhem nikaribe were bikaranîn, spreyeke benckirina cîkî dikare were bikaranîn ji bo tevizandin wi cîkî.

Çûn ji bo jora niştergeriyê

Piraniya nexweşxaneyan cil û bergên rengîn peyda dikin da ku zaroka we lixwe kin dema diçin jora neştergeriyê. Dibe ku zaroka we karibe cilên xwe lixwe ke. Heke lazim be ew dikarin potekî li xwe bikin. Hemşîreyê we dê ji we re bêje ka hûn dikarin kîjan cilên binî lê kin.

Zaroka we dikare bi piyan here odeya benckirê, li ser nivînan, bi kursiyekê an jî trolleyên nexweşxaneyê were birin. Li hin beşan awayên bikêftir yê birinê hene. Li hin nexweşxaneyan dibe ku ew di otomobîlek elektrîkê de werin birin.

Li odeya benckirinê

Hemşîre yan bijîşkek tenduristiyê, mesela pisporekî lîstikê ji beşê dê we û zaroka we bibe odeya benckirê. Zaroka we dê bikaribe pêfîstokek bigire. Telefonên destan an tablet dikarin bi taybetî kêrhatî bin ku zarokan bi lîstikan yan pêşandanên wan ên bijare bala zarokan bikişîne.

Heke hûn bixwazin, hûn dikarin bi zaroka xwe re bimînin da ku wî aram bikin dema benckirin didin wî. Pir kêmkirina şert û merc hene ku ev ne mimkun be.

Heke hûn bi xwe pir bi endîşe bin, hûn ne mecbûr in ku bi zaroka xwe re werin odeya benckirê. Endameke din ya malbatê yan hemşîreyekî beşê an terapîstek lîstikê dikare bi wî re here. Hin nihêrvan temaşekirina benckirin a zaroka xwe xemgîn dibînin - amade bin ku hûn hinekî hestiyar bibin heke hûn bixwe bi zaroka xwe re bimînin.

Dibe ku dema zaroka we li ser trolleyê be benckir dest pê bike. Zarokên piçûktir dibe ku di hembêza we de werin benckirin. Paşê dê karmend wan bidin ser trolleyê, carinan bi alîkariya we, heke hûn bikarin.

Heke ji bo destpêkirina benckir kanûla were bikar anîn, zaroka we bi gelemperî bêhiş û bi laşê xwe pir sist dibe. Carinan dikare di milê de bicemidîne yan biçiqîne. Wê hingê bijîşka bencê dê rûpoşek bikar bîne da ku benckir berdewam bike û oksîjenek zêde ya ji bo ewlehiyê peyda bike.

Heke benckir bi gazê were dest pê kirin, bijîşka bencê bi gelemperî rûpoşek bikar tîne da ku gazê bide, an ew dikarin bi dest ê hêdîka gazê bi kabekê bidin dev û pozê zarokê we. Bêhna gazên benckir mîna yên pênûsên bikeçe ne.

Dema zaroka we hat benckirin, bijîşka bencê dê kanûlayeke bi kar bîne ku aramker û dermanên bencê yên lazim bidin.

Ew bi gelemperî hinekî dem digire (ji çend xulekan heta çend deqeyan) ji bo bandorkirina benckirê. Pir normal e ku zarok di vê demê de bêhizûrî bikin an dengê bêhngirtin wan cuda be.

Paşê çi dibe?

Hema ku zaroka we di xew de be, endamek karmend dê we ji odeya niştergeriyê derxîne da ku rê bide fîmê benckirê ku niştergeriyê bidomîne.

Hûn ê nikaribin bi zaroka xwe re biçin Jora neştergeriyê, lê bijîşka bencê dê li seranserê pêvajoyê bi zarokê we re bimîne û dê fişara xwînê, lêdana dil, bêhngirtin û asta oksîjenê ya zarokê we ji nêz ve bişopîne, tesdîq bike ku ewle û bi temamî benc kiriye.

Niha demek baş e ku hûn biçin û tiştê bixwin û vexwin, lê bila karmend bizanibin ku hûn diçin û hejmara têlefona xwe ya mobîl bidin wan ku bi we re têkilî daynin.

Pişî niştergeriyê

Li odeya başbûnê

Piraniya zarokan di odeya başbûnê de şiyar dibin. Dema ku ew şiyar bibin dê bandajêke li ser kanûlaya wan hebe ku ewle be û neyê dîtin di dema şiyarbûnê de.

Di dema başbûnê de, her zarokek ji hêla bijîşkek pîspor an prafîsyenek bijare ve tê çavdêrîlêkirin ku tesdîq bike zaroka we rehet e. Heke hewce be ew ê dermanên kêmkirina êşê û dermanên dijî-nexweşiyê bidin. Dema ku zaroka we şiyar û rehet be, dê gazî we were kirin ku hûn bi zarokê xwe re bin. Anestezîst nêzik e û heke hewce be dikare alîkariyê bike.

Diltengiya şiyarbûnê

Hin zarok dema ku şiyar dibin hin nîşaneyên tevlihevbûnê û/an diltengiyê nîşan didin. Ev bi îhîmaleke mezin di zarokên biçûk ên temenê pêş-dibistanê de ye.

Hin zarok dikarin pir aciz bibin, nemaze yên biçûk. Dibe ku ew bigrîn û dest û lingên xwe bihejînin. Dibe ku ev tevger nêzîkî 30 deqeyan dewam bike, û carna dirêjtir jî. Karmendên odeya başbûnê bitecrube ne ku di demên wisa de li zaroka we binêrin. Ew

ê bifikirin ka dê zêdetir dermanên kêmkirina êşê alîkarî bike an na. Ew ê li we şîretan bikin ka hûn çawa bi rêya baştirîn dikarin zaroka xwe rehet û piştrast bikin.

Ger zarokek di nav êşê de şiyar dibe ev bi xwezayî dê û bavên ditirsîne. Ew ê hêja be ku hûn ji bijîşka bencê xwe re vebêjin heke zaroka we di demên borî de êşeke wisa kişandiye da ku ew bikaribin li ser pêşîlêgirtina vê nîqaş bikin.

Dermankirina kêmkirina êşê

Dermana kêmkirina êşê û carinan jî benckirinên cîkî di dema benckirê de têne dayîn zaroka we ku bi qasî mimkun e zaroka we wexta şiyar be rehet be. Cureyê dermanên kêmkirina êşê dê bi prosedûrê ve girêdayî be.

Bijîşka bencê, nişterger û/an xebatkarên beşê dê bi we re li ser cureyê baştirîn ya dermanên kêmkirina êşê ji bo zaroka we biaxivin.

Çûna malê

Bi gelemperî mimkun e ku zaroka we roja niştergeriyê an jî prosedûrê vegere malê ger ku bijîşk û bijîşka bencê dilxweş be ku ev vebijarkek ewle ye û zarokê ber bi başbûnê ve diçe.

Di derbarê awayê dayîna dermana kêmkirina êşê li malê dê şîret li we bînin kirin. Di heman demê de ji bo zarokan hilgirtina paracetamol û ibuprofen dikare kêrhatî be ku dema ku zaroka we ber bi başbûnê ve diçe li malê amade be. Divê hûn şîretên ku li ser dermanên kêmkirina êşa zaroka we hatine dayîn bi baldarî bişopînin.

Hin zarok di rêwîtiya malê de hest dikin yan dibe ku nexweş bibin. Kêrhatî ye ku meriv amade bibe!

Heke di roja niştergeriyê de hûn zaroka xwe bibin malê, dê nimreyek telefonê bidin we ku heke endîşeyek we li ser zarokê we çêbe hûn bikaribin bigerin.

Pirsên ku hûn dixwazin bipirsin

Heke pirsên we li ser benckirina zaroka we hebin, wan binivîsin (hûn dikarin mînakên jêrîn bikar bînin û yê xwe li cîhê li jêr zêde bikin). Heke hûn dixwazin rojekê berî niştergeriyê bi bijîşkê bencê re bipeyivin, bi koma nixandina berî niştergeriyê re têkevin têkiliyê da ku ji we re derfetê saz bike ku hûn bi telefonê bi pisporê bencê re biaxivin yan wan di klînîkê de bibînin.

1 Zaroka min çi metirsiyên taybêfî li hene?

2 Divê ez kengê dest bi axaftina bi zaroka xwe re li ser benckirê bikim?

3 Ez çawa dikarim xemgîniya zaroka xwe îdare bikim?

4 Zaroka min dê kengî bikaribe vegere dibistanê?

5 ...

6 ...

7 ...

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tîr çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tîr venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêje ka hûn çî difikirin

Ger şîroveyên we hebin, ji kerema we wan jî vê e-mailê re bişînin : patientinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa heftemîn, Cotmeh a 2023

Ev belavok dê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nixandîn.

© 2023 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok jî bo çêkirina bûjena agahiya nexweşê were kopîkirin. Ji kerema we, çavkanîya orjînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek jî vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke gunçaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê danin.